

flashhilat

fanzîna ji fotografîyê dinizile

HEJMAR: 5, HEZÎRAN 2019

Mehê carê derdikevim. Kesên dixwazin fotograf û nivîsên wan ên li ser fotografîyê di ser min re belav bin, dikarin wan ji flashhilat@gmail.com re bişînin.

Edîtor: Omer Faruk Baran

Berpirsa Belavkirinê: Leyla Arısoy

flashhilat, HEJMAR: 5

Çapa 1ê: 100 nusxe, Riha - Adar 2019

Çapa 2yan: 30 nusxe, Dîyarbekir - Îlon 2019

 **flashhilat**  **flashhilat**  **flashhilat.fanzin**

SILAVA EDÎTOR

Fanzînkârên berî me bi van karan re rabûne rûniştine dibêjin ku di fanzîn û kovaran de derxistina hejmara pêncan qonaxeke girîng e. Li gor gotina wan, pênc, pencereyekê vedike li domdarîyê û hêzeke serketina di kar de raber dike. Em jî êdî wisa difikirin: Xwendevanên me yên bi taybetî ji Instagram û Twitterê aqûbeta hejmara me ya pêncan dipirsîn, nivîskarên me yên bi meraq parvekirinên me dişopandin û çend rojan carê ji storyekê re digotin “Ka hejmara pêncan li kû ma?” têra xwe tesîra pêncan nîşanî me dan. Hinekî jî nehsîyê, hinekî ji germa havînê, hinekî ji heqê honijînê, hejmara me ya pêncan her çiqas jiber heyecana çêkirî çend royan derengderketî tê hesibandin jî, bi me em dîsa tam di wextê de xwe digêhînin rûpelên fotografîyê. Bi vê hejmara pêncan em dixwazin rind were fehm kirin ku derdê me ji fotografan pirtir fotografî ye û çawa ku “vegotin” bo fotografekî hewce ye, “negotin” jî wisa pê lazim e. flashhilat, dihezîranîne.

BIRAYÊ BIYANÎ

Şerîf Polat

Dema hişê min diçe li ser zarokatîya min, wext wek fotografekî di nava wî xanîyê zarokatîya min de zîq dibe. Ger hûn ne xwey mal û milk bin û hûn wek koçberan xanî bi xanî gerabin, hûn ê zanibin ku bîranînên zarokatîyê hew ne ji wargehekî ava ne. Zarokatîya min jî her tim bi barkirina xanîyan derbas bû. Çend xanî mane di bîra min de, nizamim, lê xanîyekî heye ku wek ava di bîrê de ye. Av tinebe, bîr kêrî ti tiştî nayê. Bîr hêdî hêdi bi kuç, qirş û gelaşên mirovên mereqdar tijî dibe ku ew mirov dil dikin dengê bîra virtûvala seh bikin û jixwe êdî ew bîreke bîroke ye.

Ew xanîyê ku ez behsê dikim ti carî terka hişê min nake. Çi wextî serê min biêşe û ez bikevim tengasîyekê, ez xwe di hewş, ban û mezelên wî xanîyî de dibînim. Xanî ne weke yê cîranan bû. Esraq û mezelên xanîyê cîranan çargoşe, bes yên me gilover bûn; xanîyê wan ji betonê bû, bes yê

me ces bû.

Bavo mêrekî xweşmêr bû, ewila ewil kurê xwe yê danzdeh salî rêkiribû, paşê jî ew bûbû rêwîyê eşqa Kurdistanê. Carincar ji me re bi rêya camêran name û çend fotograf dişandin. Piştî deh salan çend fotografên birayê min ghiştibûn destê me. Lê di wan fotografan de destê birayê min -ku min ti carî ew nas nekiribû, ji ber ku dema ew çûyî ez hê çar salî bûm- nedixuya. Dîya min û em bi wan fotografan ketibûn nav kêfxweşîyeke nîvtemam. Me digot birîndar bûye û seqet maye, lê şikir ku sax e. Ev ji bo me teselîyeke mezin bû.

Ew fotograf û name carna di nav ciwalên arvên, carna jî di binê sacên zenggirtî yên serbên de dihatin xefkirin. Ez zarokekî nehs, ji xwe re nese kinî bûm. Tiştên xef her meraqa min dikişandin û min nedikarî ez wê meraqê bikujim. Digel ku min birayê xwe nas nekiribû jî di xîyalê min de xwey cihekî mezin bû. Tenê fotografeke bebekîya min hebû û di wî fotografî de ez li milê wî

bûm, ew jî wê hingê yanzdeh salî bû. Di zamboqeke mehela Bitimkê ya Sêrtê de hatibû kişandin. Bawer im, bi saya wî fotografî û qisetên trawmatîk ên dîya min, derheqê birayê xwe de xwey hafizeyeke çîroksazî bûm. Piştî ku ew fotografên nîvtemam ghiştin destê me, min ser û sikûmê birayê xwe saz kir ve û min bîranînên xwe revîze kirin. Yekî hebû ku min berî wan fotografan dişiband birayê xwe û çiqas min ew didît, min bi heyranî lê dinêrî, lê piştî wan fotografan ew zîlamê xerîb jî ji revîzyonên min nesîbê xwe stand û ji hişê min derket.

Min behsa nehsîya xwe kiribû, ne we' ye? Min ew name û fotografên nîvtemam derdixistin û bi seatan dixwend û lê dinêrîn. Te dî, dadê ew xef kiribûn û bi kincikan parastibûn. Birayê min di nameyê de behsa halê xwe û pîrsa halê me dîkir. Digot ez li çîyayê Metîna me. Min ti carî ew çîya neditîbû, lê bi saya wê name û wan fotografan heçko çaxek emrê min li wê derê derbas bûbû.

Bi ser de wext derbas bû û me dîsa xeber ji birayê min stand. Ji me radyoyek û saeteke casio xwestibû. Me nekarîbû em radyoyê bikirrin, lê saet gihiştibû destê wî.

Wext emir ji xaniyê me bir. Carekê telefona me ya malê lê da. Jinbira min gotibû elo. Kesê telefon kirî, gotibû ez filankes im, jinbira min bawerî lê ne anîbû, lê ew kesê bîyanî gotibû ez ê hefteyeke din dîsa bigerim. Hefteyek bi kotek û heft belayan derbas bûbû, vê carê dadê çûbû li ser telefonê, dema wî dengî seh kirî qîr û hawara wê li tevahîya bajêr olan dabû. Ev kurê wê, qehremanê wê bû û ji bo wê ti carî ne bûbû kesekî bîyanî. Pirsê pêşî jê kirî bi wan fotografên nîvtemam re eleqedar bû. Ji delalê dile xwe ev pirs kiribû: Kurê min tu birîndar î? Bira gotibû siheta min bi cih e, lê dîsa jî di dile wê de şikek peyda bûbû.

Em zarok, me bi tesadûfî nimra telefona malê jî qeydî wê saeta casio kiribû. Çend salan ew nimre li

ba wî qeydkirî mabû. Nizanim, heye ku ew nimre
bûbe sedema vegera wî.

Di şevê de keda xwe ya danzdeh salan
hiştibû li çiyayên welatê xwe, tevlî tariya şevê
bûbû û li gundekî başurê Kurdistanê teslîmî
pêşmergeyan bûbû. Tirsekî ew rapêçabû, lê bi gorî
û lavayên dadê hestên vegeerê lê peyda bûbûn.
Bira li hefsa Dihokê bû û dixwest vegere. Dadê bi
tena serê xwe lê dabû û çûbû Dihokê, delalê dile
xwe anîbû û kiribû hefseke dîtir.

Dadê pêşî li rûyê wî,
paşê jî li destê wî
nêrîbû;
wê hingê ew şika
fotografên nivtemam
li ser dile dadê rabûbû:
kurê wê ne seqet bû.

EFSÛNA REALÎZMÊ

Dilxwaz Aslan

Cara yekem bû ku li wê otobûsê siwar dibûm. Min di pacê re derve seyr dikir. Otobûs di ber dikanekê re derbas bû. Weke ku min ew der berî niha gelek caran dîtibe ji min re qet xerîb nehat. Paşê min ferq kir ku wêneyê wê dikanê li ser dîmendera telefona min bû û wa ez di ber re derbas dibûm. Roja din çûm ji heman cihê li heman otobûsê siwar bûm û li ber dikanê daketim.

Çarçoveyên ku li her derî belav bûbûn, dengê muzîka klasîk ku ji radyoyê dihat û zilamekî rûken... Gelekî kêfa min ji wir re hat. Paşê roj bi roj kêfa min wisa ji xwediye dikanê re jî hat. Wî ewqas ji Gabriêl Garcîa Marquez hez dikir ku di xewnên xwe de jî ew didît. Piştî hevnasîna me bi heyvekê Marquez jiyana xwe ji dest da. Wê roja ku rojnameyan nûçeya mirina wî nivîsîbûn, anku 18ê Avrêlê, hevjinê wî rojname neanîbû jê re. Lê wî nedizanî bêyî rojnameyê dest bi rojê bike.

Çû, rojnameyek kirî û hat. Li quncikê bi çend hevokan mirina Gabo nivîsîbûn. Gava wî ew nûçe xwend, demekê mat ma, yeqîn nekir, dîsa xwend û hêstirên wî çareçar hatin xwarê. Ji wê rojê de xîmek ji giyanê wê dikanê kêm e lewra ne tenê Gabo miribû çarçove jî sêwî mabûn.




FOTO: Dilxwaz Aslan

Sîtava li Pişt Çarçoveyê, Antalya - Tebax 2017

FERHENGOKA KEZÎYÊN LI SER AVÊ

Înan Eroglu

Her çîrok hinekî jî bi mirina bavan ra eleqedar e.

Bavê min Nûredîn Xoce gava mir ez yanzdeh salî bûm. Kawik bûm têra xwe û ew çend jî çîçelaskî. Bi hevdeh salîya xwe ra ez pê hesîyam ku bavê min qutîyek li dû xwe ji bo min hiştîye. Di bîst salîya xwe da min dît ku li ser qutîyê nivîsandîye *ji bo qîza min a tebîetmelek Dilşa Çarguhar*. Heta bîst û çar salîya xwe min devê qutîyê venekir û roja îro bîst û neh salî me gava van rêzikan ji bo ferhengoka bavê xwe dinivîsim. Her temenî ez ji nû ve nivîsandim.

Di wê qutîyê da çî û çî hebû ez dê nebêjim lê divê were zanîn ku ev ferhengoka li ber destan ji qutîya bavê min derket. Wî di pêşgotina ferhengoka xwe da qal kiribû ku ev ferhengoka senaryoya nîvcomayî ya derhênerekî bi navê Elîşêr e. Senaryo bi kirmancî bûye û wî senaryo di ser wêneyên

wênegirekî bi navê Bro ra amade kirîye ku di salên 30î da li derdora Dêrsimê bûye. Bavê min navê *Kezîyên Li Ser Avê* li senaryoyê kiribû û ferhengoka wê bi kurmancî nivîsandibû.

Di vê pêşgotina kurt ya ferhengokê da behs nahê kirin ka wî ev senaryo çawa peyda kirîye, Elîşêr û Birahîm kî ne û ji kû wan nas dike. Ev pirs hemû caran ez mijûl dikirim lê tevî hemû hewl û lêkolînan jî min ti tişt li ser van kesan peyda nekir. Ji ber ku ew senaryo bi xwe jî wenda ye ez îhtimal didim du tiştan:

1. Ev jî çîrokek ji çîrokên bavê min e û ew me dixapîne.
2. Bi rastî jî ev kes (bi navinên din) hebûne lê îro bi awayekî ew û berhemên wan hatine jinavbirin û wendakirin.

Ferhengoka *Kezîyên Li Ser Avê* bi zimanê xwe hatîye sadekirin, hevokên dirêj hatine kurtkirin, hindêk peyvên biyanî bi yê kurmancî hatine guherandin, li gor alfabe û rastnivîsîna roja me ji

nû ve hatîye nivîsandin, hevokên serxêzkirî bi nîşana xêzikê (-), peyvên gumanbar bi pirsnîşanê (?) û yên nehatî xwendin û famkirin jî bi nîşana carekê (X) hatine dîyarkirin. Dîroka nivîsandinê li ser ferhengokê nehatîye nivîsandin lê ji awayê nivîsandinê dihê famkirin ku wî di ciwanîya xwe da, yanî di salên 60î da ew nivîsandîye.

Kezîyên Li Ser Avê ferhengokek e li ser întixara cemawerî ya jinên di dema Komkujîya Dêrsimê da.

Kezîyên Li Ser Avê

albûm: serencama jîyanê. beza ber bi mirinê ve. jin diqîrin: em yên avê ne, yên avê. vegera li avê. *bnr. av.*

av: mûcîzeyaya ku jinan dikişîne ber bi xwe ve. aqûbeta jîyanê. derîyek e ji malê ra. Li xwe vedigere gava kezîyên wê bi ser avê dikevin. av laşî digihîne destpêka çîrokê.

awir: bobeleta sûretan diderizîne. gava keçik bi dawa ~~fîstanê~~ xwe digire û xwe di xiramê ra wer dike, ew tûjtir û kûrtir dibin. dixwaze bibêje: van ji bîr neke.

bar: xelîkek (?) e di stûyan da. wêne nîşan dide ew koma jinan li bin xelîkeka (?) giran e. xwe kuştin wek xilasîya bar e ji bo wan. *bnr.* can.

bîr: çarçoveya li dîwarî. kana serhatîyan. leşkerên çavsût. zarokên berşîr.

bombe: barana rehmê.

can: ~~teyrikê di qefesê da.~~ her kes û xwe. jê girîngtir tune û jê erzantir jî tune. û jê xilas dibin jin li ber bayê pelan (?). êdî ew barek e.

ceng: dinyayeka li ser du qiloçan. bi qiloçê rastê ra Dêrsim diheje. bi qiloçê çepê ra jinên Dêrsimê. jin ne ji cengan, ji bênamûsan direvin.

çav: bê guman ew her tiştî dibîne. jin gava diçin mirinê çavê wan girs dibe. hûr dibe yê di ser her tiştî ra. *bnr.* nêrîn.

çerm: derdê çavsoran. dixwest xwe bipêçe jina navsere. tenê çermê wê mabû. ew jî bû para Munzûrê.

çiçik: ya ku berê şîrzem bû lê îro bûye XXXXXXXXXXXXXXXX
XXXXXXXXXXXXXXXXXX

deng: gerokê ji pişt çîyayên dûr hatî. ji nav zemanan. zêmarek e li ser mirina hatî. jinên Dêrsimê pêşî dengê xwe avêtin çemî.

~~**Dêrsim:** bîra strîyan. wêneyên serê jêkirî, jinên hatî tazîkirin. jinên li berkendalan.~~

evîn: xweş e. ew jina dêresor gava xwe avêt ser tehtî, evîna wê jî pê ra hûrhêra bû.

Fato: zarokeka çardeh salî. lê êdî jineka gef li mirinê xwarî li ber çavê bavê xwe. ji bo nekeve dest çavsoran, xwe di gelîyê Îqsorê ra wer kir. *bnr.* Îqsor.

gelî: goristaneka veşartî. hîn jî bê kêl in.

gule: derîyê jîyanê. her tişt bi derbekê ra dest pê dike. bi derbekê ra berî serê xwe dan komek jin.

hewa: ya ku bêhna me pê derdiket. Barûd (?) edem (?) kar (?) kir, bêhna jinan kêr (?) bû.

întixar: peyvek e ku bû axirîya jinên Dêrsimê.

Îqsor: rojekê hemû jinan biryar girtin û gotin: xilasîya me li vî gelîyê ye.

jîyan: XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX
XXXXXXXXXX

kezî: hemû binav bûn, kezîyên wan jî serav.

kurd: dema li derîyê mirinê dan çiqasî xwe kurd dihesibandin di wêneyan da xuya nake, lê têra xwe kurd bûn li ber çavê dijminên xwe.

leşker: ew kes bûn ku bûn sebeb jinên Dêrsimê xwe biavêjin nav avê, ser tehtan, guleyan berî serê xwe bidin. her tişt berî destdirêjîyekê dest pê kir.

mirin: pêşwazîya li tebîetê. jina zarok li milê wê, bê xem xwe da ber pêlên Parçîkê. awaza heybet belav XXXX
bnr. Parçîk.

Munzûr: çemê ku bi rojan malovanî li kezîyên reş kir. mêvandarê çak.

nêrîn: tîr li pey armanca xwe ye. tê da cît (?) dibin. leşker heyretzede ne. di nav avê da jî çavê wan dibêje: ez XXXXXXXX

Parçîk: destebirakê Munzûrê. jin gava baz dan û xwe avêtin bextê wî, hembêza xwe li wan vekir. kilameka kevn e.

pêl: dengê ku ji hezarsalan bang dike: tu weha hatî û dê weha biçî.

por: *bnr.* kezî.

qeder: ew li enîya wan nehatibû nivîsandin. wan dizanibû çî li pêşîya wan e gava piştî xwe dan jîyanê û berê xwe dan pêlên dilbirehm yê jîyaneka din.

reng: xwîn. tenê rengê hebû wê rojê: xwîn. ava xwîn. kezîyên xwîn. darên xwîn. esmanê xwîn. çîrok bi xwînê bi dawî bû.

rojname: wê rojê kes qala wan nekir. ~~parçeyek kaxezê vala.~~

sor: reş. wêneyê Dêrsimê. gava Bro li wêneyan dinêre, dibîne ku niqutkek sor bi destê wî ve zeliqîye. niqutkek reş.

sûret: em biçin ku jî li me dinêre. ew awir dide dû me. nêrîn careka din bi laş û gewde dibin. ew eynika çavê me diderizîne. *bnr.* wêne.

şimik: fereka wê li peravê daye. dawîya wê jî bi qasî ya kezîyên xwedîya xwe ye.

şîr: zarok jî pêl dide bi dêya xwe ra. belkî jî ne dêya wî be. devê xwe yê biçûk daye ser çîçikî. ew êdî ne şîr e.

tebîet: helbesteka henûn. awazeka nerm. wê rojê cardin derîyê xwe li jinên Dêrsimê vekir, ew hubandin (?). ~~xwîna wan bi ava xwe paqij kir.~~

teht: got: tu bi xêr hatî ey dinya! îro jî ne bi tenê me, dostên min in ev gewde û laş.

veger: birêveçûneka jixwebawer. aramî. av germ e bi qasî hundirê malê. ewle ye bi qasî malzarokê, her çiqas zarokan jî ji malê derxistibin.

welat: xeyaleka dûr. dayîka ku bi her sê keçên xwe hat ber xiramê, jê ra got: min xêr ji te nedît. ji wê rojê ve ye dibêjin kes ji vê peyvê xêr nedîtîye.

wêne: reş û spî. lê xwîn her tim reş bû di wêneyan da. Bro dû ra bi boyaxê sor kir. kamera her cara ji wêneyekî derbasî wêneyekî din dibe, dinyayeka din li me tesele dibe. dibêje: em li vir in, li vir.

xiram: XXXXXXXXXXXXXXXXXXXX li ser wê disekine-
~~rawestgeha mirinê.~~ rêvî (?) ji bo jîyana nû dikevin dorê.

xwîn: jê zêdetir çi heye? jinên Dêrsimê ji laşê xwe çemek çêkirin.

yek: ne tenê hejmarek e. yek hebû çavdêrîya hemû jinan dikir.

zarok: gelek caran nizanibûn dêya wan diçe kû. dêya wan li ber çavê wan bûbû kelek. diherikîn.

ziman: venabe carinan. û gava vedibe qet nasekine. XXXXXXXXXXXXXXXXXXXX wê rojê heta ber avê qet nesekinîn. devê wan XXXXXXXX

DIZIYEKE FOTOGRAFÎK

Rêbîn Ozmen

Berî bi çend salekî ji bo em belgefilmên cihên dîrokî yên Kurdistanê, ji televîzyonekê re bikşînin em li derên dîrokî digeriyan. Rojekê me berê xwe da Marînê û ji wir jî em derbasî Dêr Marewgê (Mor Evgîn) bûn ku hema bêje bi kîlometreyek û nîvê ji Marînê dûr e. Ev dêra asê ku ji aliyê dîroka Îsewîtiyê ve girîng e, di cîhanê de yek ji wan çend dêrên ewil eku aqda wê pir bilind e. Werhasil, em çûnê dêrê, me derdê xwe ji keşîşê dêrê re got û me destûr jê xwest ji bo kêşana fotograf û vîdeoyan. Camêr piştî çend pirsan destûra me da û got piştî nîv saetekê kerem kin werin çayê vexwun û hem em ê hinekî jî sohbetê bikin. Piştî nîv saetê me kêşan kir em hatin ku em çayê vexwun.

Keşîş ji min pirsî ka gelo ez Gertrude Bell nas dikim an na. Min got “nav ji min re xerîb nayê” lê nehate bîra min. Bi rastî jî min di binê

çend wêneyên kevin de navê wê dîtibû. Keşîş got “naxwe tu nizanî bi meseleya wê. Min got “mixabin” û wî dest bi meseleyê kir. Di baweriya min de bûyera ku got, di dîroka Kurdistanê de diziya ewil ya fotograf û mekîneya fotografan e.

Gertrude Bell, jineke Ingilîz e ku di navbera salên 1868 û 1926an de jiyaye. Ew; arkeolog, nivîskar, şair, seyah, çiyager û di heman demê de jî wezîfedara Rêxistina Îstîxbarata Ingîltereyê ye. Gertrude, ji bo wezîfeya xwe li Rojhilata Navîn û Kurdistanê digere û fotografên cihên dîrokî û yên jiyana rojane yên şênîyan van deran dikşîne. Ew, bi taybetî li Diyarbekir, Mêrdîn, Heskîf, Farqîn, Heran, Urfa, Erxenî, Nisêbîn û Midyadê digere.

Bell, cara pêşî di sala 1909an de di navbera 20-30 Gulanê de tê Midyadê. Bell, cara duyem di sala 1911an de di navbera 15-22ê Avrêlê careke din tê Midyadê û vê carê li hatina xwe poşman dibe. Dîroka ku me eleqedar dike jî ev e. Êdî çîroka me jî li vir destpê dike jixwe.

Bell dema tê Midyadê diçe gundê Haxê yê Suryaniyan û li wê derê kampa xwe datîne. Li derdorê digere û fotografan dikşîne. Dema êvarî radizê, nobedarê wê jî radizên û kesek an jî kesine gundî bi şev tên ji konê wê fîlmên fotografan yên hatine kêşandin û mekîneya wê ya fotografan û alavên wê yên din didizin. Sibehê Bell, alîkarekî xwe dişîne gundê Mizîzexê cem Çelebî Axa.



Foto: Gertrude Bell

Çelebî Axa û peyayên wî - Gulan 1909

Çelebî Axa ji Mizîzexê tê Haxê û bi saya tercûmanîya papazê dêra Haxê ji devê Bell li bûyerê guhdar dike. Bell her tiştî vedibêje û lê zêde dike ku heke tiştên wê yên hatine dizîn neyên dîtin, ew dê “cîhanê bi ser serê wan de xera bike” Li ser vê yekê Çelebî Axa gundiyan dide hev û ji wan re dibêje ku, heya sibehê ev alavên vê jinikê neyên vê derê, ew dê gundê wan bi ser serê wan de hilweşîne. Piştî gelek lêkolîn û lêpirsînan roja sisiyan gundiyekek tê û dibêje “vaye alavên te hatine dîtin.” Diçin dinêrin ku ji bilî pereyan her tiştê ku hatiye dizîn, fîlmên fotografan, mekîneya fotografan û hemû alavên din anîne û danîne ser latekê. Dizan tenê pere neanîne. Dizîya fotograf û mekîneya fotografan cara ewilê bi vî hawî li Kurdistanê diqewime.

Têbinîya Edîtor: Gertrude Bell di rojnivîsk û nameyên ku di Gulana 1909an de nivîsîne behsa dizî û dizan dike. Bi weşandina vê nivîsa li jor, me xwest ku ew bûyera hanê, bi şêweya di nav gel de tê zanîn jî were xwendin.

